# Ji Erdogan gefa dagirkeriyê



Serokomarê tirk û serokê giştî yê AKP'ê Recep Tayîp Erdogan di her fersendê de gefan li kurdan dixwe. Erdogan di çarçoveya dijminahiya gelê kurd de dîsa gefên dagirkeriyê li rojavayê Kurdistanê xwarin. Serokkomarê tirk bi awayekî aşkera li xwe mikur hat ku ji hebûna kurdan a li bakurê Sûriyeyê wan aciz dike û îdia kir ku ew herêm ya kurdan nîn e û ew ê herêmê dagir bikin.

Tayyîp Erdogan got dê di nav çend rojan de li hemberî rojavayê Kurdistanê operasyona dagirkirinê bidin destpêkirin. Dewleta tirk a dagirker û qirker ku ji destpêka şerê Sûriyeyê ve bi komên çete yên mîna DAIŞ, El Qaîde re bi hevkarî tevgeriya û piştre bi komên xwe yên çete yên ava kirî, herî dawî Efrîn dagir kiribû. Li deverên ku ji aliyê dewleta tirk ve hatine dagirkirin her roj sûcên şer tên kirin.

## Frîda Hecî Cewarî koça dawî kir



Nivîskara kurd Frîda Hecî Cewarî di 84 saliya xwe de li Erîvanê jiyana xwe ji dest da. Cewarî di 1934'an de li Erîvanê ji dayik bû û zêdetirî 20 pirtûk nivîsandine. Frîda keça Heciyê Cindî û hevsera Fêrikê Usiv bû.


# @rojname

13 Kanûn - Pêncşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 203


## Platforma ziman bang kir



Platforma Zimanê Kurdî ku bi tevlêbûna 9 partiyên kurd hate avakirin, bi daxuyaniyekê bang li nivîskar, ronakbîr û hunermendên kurd kir ku bêyî ku li benda vexwendnameyekê bimînin, bila tev li xebatan bibin. Platformê ji bo hemû partiyên kurd pêşniyar kir ku pîvana zanîna zimanê kurdî bê danîn.

# YEK BÛ HEZAR

## Piştî Leyla Guven bi hezaran kes ketin greva birçîbûnê. Li girtîgehan 600 girtiyên siyasî niha di grevê de ne




### KET ROJA 36'EMÎN

**HEVSEROKA** KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 36 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye.

### REWŞ GIRAN BÛ

**PARÊZERÊ** Leyla Guven, Cemîl Şivan Ozen da zanîn ku li ser mejiyê Guven tumor heye û ji ber dermanê wê nadinê nexweşiya wê giran bûye. Li aliyê din çalakiya greva birçîbûnê ku Guven da destpêkirin roj bi roj mezin dibe.

### AMEDÊ BERSIV DA

**DEWLETA** tirk li Amedê 25 kesên ku ketibûn greva birçîbûnê binçav kirin. Gelê Amedê bi berxwedanê bersiv da êrîşê û vê carê jî 50 kesan dest bi greva birçîbûnê kir. Polîsan dîsa êrîş pêk anî û 50 kes binçav kirin... RÛPEL - 3

### Ev têkoşîna hemû jinan e

Jinên sûryan ên li Dêrika girêdayê Kantona Qamişloyê axivîn û anîn ziman ku têkoşîna Guven a li dijî tecrîdê têkoşîna hemû jinan e... RÛPEL - 2

### Bi xêzkirinê peyama grevê

Rojnameger û şêwekar Zehra Dogan a girtî piştgiriya xwe bi xêzkirina wêneyên Leyla Guven a li dijî tecrîdê ketiye greva birçîbûnê diyar kir. Dogan bi îdiaya propgandaya rêxistinê kiriye hatiye girtin.



## Piştgirî dan rojnamegeran

Rêxistinên rojnamegeran ên navneteweyî piştgirî dan 5 rojnamegerên ku di nobeta gerînendeya weşana giştî ya Ozgur Gundemê de cih girtin û ceza li wan hat birîn. Her wiha hat xwestin ku rojnameger serbest bên berdan.



## Ma cewabê faşîzmî bidî

Amadekarîya weçînayîşê herêmî bêmabên dewam kena. Parlamenter Serpîl Kemalbaye dîyar kerde ke îqtîdar do 31ê adare de bêro cezakerdiş û herinda xo tepîya bigêrî û va: "Ma wazenê ke 31ê adare biba roja vengê cinîyan yê Kizilcakoyo ke... R.5

## NPG'ê gel hişyar kir


Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel (NPG)'ê diyar kir ku li bajarên Kurdistanê û metropolan, bi nameyên bi navê HPG'ê hatine nivîsandin pere tên komkirin û ji welatparêz û demokratan xwest ku baweriya xwe bi van çeteyan neynin... RÛPEL - 3



## Dadger li xwe mikur hat

Danişîna doza hevserokê HDP'ê yê berê Selahattîn Demîrtaş li Enqereyê pêk hat. Demîrtaş bi kurdî dest bi axaftina xwe kir û tecrîd şermezar kir. Dadger li xwe mikur hat ku alîgir e û li salonê rageşî derket.





## Axa xwe parastin

Danişîna 5'emîn a Doza Nisêbînê di roja duyemîn de jî li 4'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Mêrdînê hat dîtin. Girtiyan got ku wan axa xwe parastiye û divê hêzên mîlîtarîst bên cezakirin... RÛPEL - 3



## Dewletê goştê me xwar...

Dema mirov dibêje bîr, du tişt tên bîra mirovan; yek bîra avê û yek jî bîr ango hişê mirovan. Belgefîlma "Bîr"ê cara ewil hat pêşandan. Malbatên ji bo dîtina cenazeyên xwe têdikoşin wiha dibêjin: "Dewletê goştê me xwar, em hestiyan dixwazin."... RÛPEL - 6



## Jin dixwazin beşdarî hikûmeta nû bibin

**HEWLÊR -** Li Hewlêrê jinên di nava partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê de xwedî peywir in û di nav Koma Aştiyê ya Jinan de ne, sêyemîn Dîdara Lûkteya Jinan pêk anîn. Di dîdarê de bal li ser beşdarbûna jinan a di proseya siyasî ya Herêma Kurdistanê de hat kişandin. Di dîdarê de jinan aşkera kir ku divê jin û mêr bi hevsengî li navendên biryardayînê û pêvajoyên siyasî yên Herêma Kurdistanê cih bigirin û gotin ku divê di kabîneya nû ya hikûmeta Herêma Kurdistanê de jin jî cih bigirin û kar bikin. Her wiha li Herêma Kurdistanê guftûgoyên li ser kabîneya nû ya hikûmetê didome lê nayê zanîn dê di kabîneya nû de jin cihê xwe bigirin an na!

# Xwendin ronahiya di tarîtiyê de ye

Dayika Mehewş Reşîd tevî ku di temenkî biçûk de tê zewicandin jî dev ji xwendinê bernade û ji ber vê hezkirina xwendinê mala xwe veguherandiye pirtîkxaneyê. Dayikê diyar kir ku ew evîndara zimanê xwe ye û destnîşan kir ku xwendin ronahiya di tarîtiyê de ye

Stêrvan BÊRÎTAN - Dil û Can BOZÎ / QAMIŞLO - JINNEWS

Jina bi navê Mehewş Reşîd tevî ku di temenê zarokatî de tê zewicandin jî, zanîngehê dixwîne û dev ji têkoşîna jiyanê bernade. Reşîd a ji bajarê Amûdê yê girêdayî kantona Qamişloyê niha mala xwe kiriye pirtûkxane û bi evîna xwendina pirtûkan ji zimanê dayikê re xizmetê dike.

Reşîd diyar kir ku têkoşîna ji bo zimanê dayikê ji bo wê pîroz e û wiha got: “Peywira min a herî girîng li gor min xwedîderketina mîrateya dayik û bavan e. Mîrateya dayik û bavan a ku zimanê qedîm ji me re hiştiye divê her dem xwedî lê bê derketin.”

**Beşa hiqûqê qezenc kir**

Di axaftina xwe de Reşîd anî ziman ku ew di temenê biçûk de hatiye zewicandin loma jî wê gelek zehmetî kişandine û wiha domand: “Hîn ez diçûm dibistanê ez hatim zewicandin. Zarokên min çêbûn lê li gel hemû zehmetiyan dîsa jî min xwend û min zanîngeha hiqûqê qezenc kir. Lê piştre ji bo xwedîkirina zarokan ez mecbûr mam ku dev ji zanîngehê berdim. Piştre jî min li Şîrketa Petrolê ya Rimêlanê dest bi xebatê kir.”

**Bi xwendinê bextewar dibe**

Di berdewamê de Reşîd da zanîn ku ji zarokatiya xwe ve ye ku ew ji xwendinê gelekî hez dike û wiha berdewam kir: “Ez çiqas pirtûkan bixwînim jî aciz nabim. Berevajiyê vê yekê bêhtir dixwazim bixwînim. Dema ez pirtûkan dixwînim gelek bextewar dibim. Xwendin di taritiyê de ronahiyê dide mirov. Ji ber ku ez di temenekî biçûk de hatim zewicandin û zarokên min hebûn min di warê xwendinê de zehmetî dikişandin lê dîsa jî min hewl dida ku bixwînim. Di destekî min de zaroka min di destên min ê din de jî pirtûka min hebû. Min dema ku zarokên xwe li ser lingên xwe kil dikir jî min pirûka xwe dixwend.”

**Xwendin mirovan bi pêş dixe**

Her wiha Reşîd diyar kir ku xwendin ji her alî ve mirovan bi pêş ve dixe û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Ji ber evîna xwendinê min ji xwe re pirtûkxaneyek ava kir. Di pirtûkxaneya min de her cure pirtûk hene. Pirtûkên civakî, dîrokî, wêje, çand, olî hemû hene. Ez evîndara zimanê xwe me. Her bi xwendinê min xwe bi pêş xist û daxwaza min ew e ku hemû ciwan bi xwendina bi zimanê dayikê xwe bi pêş bixin û bibin mînak.”



# Zarokên berxwedanê; Avesta, Serdem û Ferman

Jinên ku bûn şahidê Berxwedana Serdemê û ji serlhildana li dijî zilm û zordestiyê feyz girtin navê zarokên xwe kirin Avesta, Serdem û Ferman. Jinên ku dixwazin bi navên Avesta, Serdem û Ferman ruhê Berxwedana Serdemê zindî bihêlin wiha gotin: “Li dijî êrîşên neyaran û dagirkeran têkoşînek dîrokî li Efrînê hat dayîn. Em ê her şopdarên vê têkoşînê bin.”

Jina bi navê Nisrîn Nasêr diyar kir ku ew bûye şahidê berxwedana serdemê û hovîtiya dagirkeran û wiha got: “Dema ku dewleta tirk a dagirker bi top û tankan êrîşî Efrînê dikir ez ducanî bûm. Ez bûm şahidê berxwedana 58 rojan. Min ji têkoşîna jinên kurd ên leheng feyz girt û min navê zaroka xwe kir Avesta. Çimkî şehîd Avesta Xabûr li dijî neyaran û dagirkeran serî netewand. Dê zaroka min jî feyzê ji navê xwe bigire û li dijî neyar û dagirkeran serî netewîne.”



**Ji bo siberojek azad xwe feda kirin**

Xedîce Mustefa ya ku navê zarokê xwe kiriye Ferman jî ev tişt anî ziman: “Şehîdên me yên ku ji bo axa xwe û gelê xwe canê xwe feda kirine, em ji dil bi bîr tînin. Şehîd Ferman jî ji bo siberojek azad a gelê kurd canê xwe feda kir. Ez ê bi hilgirtina navên şehîdan çîroka berxwedana serdemê her zindî bihêlim. Di rêya felsefeya Serok Apo û di rêya şehîdên ku ji bo axa xwe û azadiya gelê xwe canê xwe feda kirine ez ê zarokên xwe mezin bikim û têkoşîna xwe bidomînim. Em ê heta dawiya emrê xwe bi şehîdên xwe ve girêdayî bin.”

**Ji berxwedanê feyz girtine**

Her wiha Lemiya Hisên a ku navê zaroka xwe kiriye Serdem, da zanîn ku dewleta tirk û çeteyên wê bi alîkariya hêzên navneteweyî bi hemû çekên giran êrîşê gelê Efrînê kirine û ev tişt vegot: “Gelê Efrînê jî li dijî vê yekê bi ruhê berxwedana serdemê li ber xwe da. Min ji berxwedana serdemê feyz girt û navê zaroka xwe kir Serdem. Em ê her ruhê Berxwedana Serdemê zindî bihêlin. Li dijî êrîşên neyaran û dagirkeran têkoşînek dîrokî li Efrînê hat dayîn. Em ê her şopdarên vê têkoşînê bin.” *ŞEHBA*



# Beniyên gûzan ên mirov ji çêja wan têr nabe

Çanda çêkirina beniyên gûzan ji dîrokê heta niha didome. Yek ji jinên ku vê çandê didomîne Necah Ismayîl a 40 salî ku li bajarê Hesekê ye.

Ismayîl diyar kir ku di berdewamiya çanda kevnar de her xwedî roleke girîng in û wiha got: “Niha bi çêkirina beniyên gûzan ez hem ev çanda kevnar didomînim hem jî vê çêja xweş a beniyên gûzan nadim jibîrkirin.”

Ismayîl anî ziman ku ew ji xwişka xwe hînî çêkirina beniyên gûzan bûye û wiha domand: “Em her sal beniyên gûzan çêdikin. Em ji bo zarok û mêvanên xwe çêdikin. Em gûzên xwe bi benî dadikin û piştre di nava şîreya gebolê ya ku ji tirî çêdibe, dadikin. Em çend caran di nav şîreyê de dadikin. Beniyên gûzan ji bo zivistanê gelekî baş in. Hem mirov pê têr dibe hem jî ji bo tenduristiya mirovan jî gelek baş e. Di heman demê de bi çêkirina beniyên gûzan û bastiqê em çanda xwe jî nadin jibîrkirin.”

Her wiha Ismaîl da zanîn ku keda destên mirovan bi nirx e û wiha dawî li axaftina xwe anîn: “Ez bi çêkirina beniyên gûzan bi dilxweşî mijûl dibim. Çimkî keda destan her bi wate ye. Di berdewamiya çanda kevnar de jin her xwedî rolek girîng in. Niha bi çêkirina beniyên gûza ez hem vê çanda kevnar didomînim hem jî vê çêja xweş a beniyên gûzan nadim jibîrkirin. Em hêvî dikin ku em ê di bin siya aştî û azadiyê de çanda xwe her bidomînin.” *HESEKÊ*



# Jinan bi HDP’ê re di nava siyasetê de cihê xwe girt

Li Mêrdînê Rozerîn Îldenîz (20) a ku ji bo encûmeniyê serî li HDP’ê da, diyar kir ku ji ber HDP partiya jinan e û ew ji HDP’ê bûye bernamzet.

Îldenîz ku hêj xwendekar e û heta niha di nav siyasetê de cih negirtiye, destnîşan kir ku ew dixwaze di HDP’ê de fêrî hin tiştan bibe û wiha got: “Armanceke min heye, ew jî azadî û dawîlêanîna êrîşên li ser jinan e. Ji ber ku dema mirov lê dinihêre ji demên berê heta niha li dijî jinan êrîş, kuştin, komkujî gellek zêde tên kirin. Ji bo ku dawî li hemû van êrîşan bê ez bûme bernamzet û dixwazim bibim dengê jinan. Ji bo ku saziyên jinan ên bi destê qeyûman hatin girtin ji nû ve bên vekirin divê em bi ser kevin. Ji bo ku em bi ser kevin em ê derî bi derî û kolan bi kolan bigerin û projeyên xwe ji gelê xwe re ragihînin.”

**‘HDP ziman, hebûn nasname ye’**

Her wiha Îldenîz da zanîn ku HDP partiya jinan û gelan e û wiha dawî li axaftina xwe anî: “HDP ziman, hebûn û nasnameya me ye. Jinan bi HDP’ê xwe da îspatkirin û di nav siyasetê de cihên xwe girt. Loma ez jî di HDP’ê de bûm bernamzet.” *MÊRDÎN*



# Jinên wek Guven dikarin faşîzmê têk bibin



Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û parlamentera HDP’ê Leyla Guven ev 36 roj in ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di greva birçîbîna ya bêdem û dorveger de ye. Li çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê piştgiriya ji bo çalakiya Guven belav dibe.

Der barê çalakiya Guven de jinên suryan ên ku beşdarî çalakiya greva birçîbûnê ya li Dêrikê ya girêdayî kantona Qamişloyê bûn axivîn û anîn ziman ku têkoşîna Guven a li dijî tecrîdê têkoşîna hemû jinan e.

Yek ji van jinan Seyidê Hene diyar kir ku divê li dijî faşîzmê hemû mirovên li cîhanê bibin yek û wiha got: “Em Leyla Guven û hevalên wê yên di zindanê de silav dikin. Leyla jineke mafdar e loma divê hemû jinên cîhanê piştgiriyê bidin wê. Leyla di zindanê de li dijî faşîzmê li ber xwe dide. Hêza jinên wek Leylayê wê faşîzmê têk bibe.” Jina bi navê Corcêt Ebdilnûr jî nêrîna xwe wiha anî ziman: “Em dixwazin Rêber Apo azad bibe. Em heta dawiyê piştgiriyê didin çalakiya Leyla Guven. Leyla mînaka têkoşînek dîrokî ye. Em ê bi hêz û îradeya jinên wek Leylayê faşîzmê têk bibin. Ji bo rûmeta tevahî jinan em ê heta dawiyê piştgiriyê bidin Leylaya leheng. Têkoşîna Leylayê têkoşîna hemû jina ne.” *DÊRIK*

# Perwerde misogeriya pêşxistin û nûkirina jinan e

Li Akademiya Kongreya Star a bajarokê Rimêlana navçeya Girkêlegê ya kantona Qamişloyê di 29’ê mijdarê de ji bo pêşxistina feraseta jinan dewreya perwerdeyê ya bi navê ‘Şehîd Mediya Mava’ hat destpêkirin. Ev perwerde bi tevlêbûna 23 jinên rêveber ên meclisên Kongreya Star û giştî herêma Cizîrê hat destpêkirin. Jinên ku tev li dewreyê bûne nêrînên xwe anîn ziman û bandora perwerdeyê ya li ser xwe nirxandin.

Jina bi navê Nesrîn Dahir li ser girîngiya perwerdeyê axivî û ev tişt anî ziman: “Di nav perwerdeyê de em gihîştin wê astê ku êdî em dikarin rêxistina jinan bi rê ve bibin. Bi zanebûn, fêmkirin, çareserkirina pirsgirêkan û asta bilind ku jinê ji bo naskirina heqîqet û têkoşîna xwe bi dest xistiye gelek girîng e. Ji bo wê jî em dibêjin ku çiqasî em xwe perwerde bikin em zana dibin û fikrên xwe jî nû dikin.”

**‘Perwerde mirovan pêş dixe’**

Jina bi navê Rodîn Isa jî wiha nêrîna xwe anî ziman: “Di perwerdeyê de mirov dibin xwedî nêrînên berfireh. Perwerde pêşxistina şexsê mirov e. Vîna mirovan xurt dike. Bi ruhekî hevpar jiyaneke komunal tê avakirin. Ger perwerde tune be mirov nikare xwe bi rêk û pêk bi rê ve bibe. Perwerde misogeriya pêşxistin û nûkirina jinan e.” *GIRKÊLEGÊ*



# Hejmara çalakvanan zêde dibe

Piştî binçavkirina 25 endamên TJA û Dayikên Aştiyê yên li Amedê, HDP'ê bi tevlêbûna 50 kesan çalakiya greva birçîbûnê dewr girt. Lê piştî destpêkirina çalakiyê polîsan avêt ser avahiya HDP'ê û gelek kesan binçav kirin

Ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, komeke nû ya ji 50 rêveber û endamên HDP'ê pêk tê, li avahiya HDP'ê ya Amedê çalakiya greva birçîbûnê dewr girtin. Parlamentera HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun jî piştgirî da çalakvanan. Beriya destpêkirina çalakiyê daxuyanî hat dayîn.

Di daxuyaniyê de Remziye Tosun çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a ku hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyle Guven dabû destpêkirin bi bîr xist û da zanîn ku Guven ev 36 roj e ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan di grevê de ye. Tosun anî ziman ku Guven li dijî tecrîdê, zilmê û polîtîkayê qirkirinê di greva birçîbûnê de ye û wiha got: "Me jî weke parlamenterên HDP'ê, hem ji bo xwedî derketina li çalakiyê û hem jî ji bo em bêjin daxwaza Leyla Guven daxwaza me ye bi hêzek xurt li çend bajaran dest bi çalakiyê kir."

**Dorpêça bê sedem û bê hiqûq**

Tosun binçavkirina çalakvanên li Riha, Amed, Êlih û Wanê bi bîr xist û wiha domand: "Bi sedan polîs, dayikên ku ketibûn grevan birçîbunê bi erdê re kaş kirin. Bi dehan hevalên me hatin derbkirin û binçavkirin. Di bin navê lêgerînê da avahiyên partiya me hatin talankirin û pankartên me qetandin. Avahiya me ya Amedê ev meheke di dorpêça polîsan de ye. Ji roja destpêkê ya dayîna starta hilbijartinê heta niha, zexta li ser rêveber û endamên me yên navend û navçeyan zêde bûn. Gelek kes hatin binçavkirin û girtin. AKP dizane ku şaredariyên xesp kirin, dê winda bike. Bi van êrîşan dixwaze çavê gel û xebatkarên me bi tirsîne. "

**'Her êrîş dê mezintir û xurttir bike'**

Her wiha daxuyanî wiha bi dawî bû: "Binçavkirina aktîvîstên TJA'yê ku di çalakiya greva birçîbûnê de bûn, nîşaneya AKP'ê ya li hemberî têkoşîna jinan e. Em dixwazin ku ev hevalên me di zûtirin dem de bên berdan. Ji bo piştgiriya bi çalakiya Leyla Guven û girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê, 50 hevalên me dest bi greva birçîbûnê ya 3 rojan dikin. Bersiva me ya li dijî dagirkeran û polîtîkayên înkarê ev e. Em roj bi roj mezintir dibin. Çiqas êrîş bikin bila bikin, em ê xurttir û mezintir bibin."

**Çalakî careke din dest pê kir**

Tevî êrîşên polîsên dewleta tirk jî çalakiyên greva birçîbûnê bi israr berdewam in. Di vê çarçoveyê de li Wanê jî HDP'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku wan careke din greva birçîbûnê ya 3 rojan daye destpêkirin. *AMED - WAN*





## Polîs çalakvan binçav kirin

Li Amedê bi armanca şermezarkirina tecrîda li ser Ocalan 50 rêveber û endamên HDP'ê dest bi greva birçîbûnê kir. Piştî koma duyemîn dest bi grevê kir, polîsan bi ser avahiya HDP'ê ya Amedê de girt. Piştî polîsan bi maşîneyên zirxî avahiya HDP'ê dorpêç kir, bi tevlêbûna gelek polîsên hêzên çevîk bi ser avahiyê de girtin. Polîsan 50 kesên ku li dijî tecrîdê û bi armanca piştgiriya çalakiya Leyla Guven ketibûn grevê binçav kirin. 2 roj berê jî 300 polîsên hêzên çevîk bi ser avahiya HDP'ê de girtibûn û 25 çalakvanên TJA'yê binçav kiribûn. 25 kesên di 10'ê kanunê de hatin binçavkirin jê 2 dayik hatibûn berdan. Her wiha polîsan kesên hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Amedê. *AMED*

## Li 117 girtîgehan 600 girtî di grevê de ne



Bi armanca rakirina tecrîda girankirî ya li ser Ocalan, ji 27'ê mijdarê heta niha li gelemperiya girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê, girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê di greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger de ne.

Têkildarê rewşê rêvebirê Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) Bunyamîn Şeker axivî.

**Vîtamîna B12 nadin girtiyan**

Şeker anî ziman ku ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Ocalan ji 27'ê mijdarê ve girtî di grevê de ne û diyar kir ku ji daxuyaniya girtiyan jî xuya dibe ku dê çalakî bidome û wiha got: "Ger pirsgirêk neyê çareserkirin, dê ev çalakî veguherin asteke cuda. Me li girtîgehê hevdîtin kir. Derket holê ku vîtamîna B12 nadin girtiyan. Me xwest têkildarî mijarê bi rêveberiya girtîgehê re hevdîtinê bikin lê ev daxwaza me hat redkirin."

Her wiha Şeker destnîşan kir ku li Girtîgeha Jinan a Xarpêtê 6, li Girtîgeha Jimar 2 ya Xarpêtê 18, li Girtîgeha Jimar 1 a Xarpêtê 21 girtî di çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne û got ku bi giştî li 117 girtîgehan zêdetirî 600 girtiyên siyasî di çalakiya greva birçîbûnê de ne.

**Armanc azadiya Ocalan e**

Ji aliyê din ve girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê yên di greva birçîbûnê de ne, bi rêya malbatên xwe ragihandin ku ger daxwazên wan pêk neyên dê çalakiyên xwe radîkaltir bikin û diyar kirin ku tenê armanceke çalakiya wan heye ew jî azadiya Ocalan e. *AMED - MÊRDÎN*

## 'Guven nikare dermanê xwe bigire'

Parêzerê Leyla Guven Şivan Cemîl Ozen li ser rewşa miwekîla xwe axivî û diyar kir ku li ser mejiyê Guven tumor heye û ji ber dermanê wê nadinê nexweşiya wê giran bûye.

Parêzer Ozen diyar kir ku Guven piştî roja 30'yemîn a çalakiyê ketiye asta krîtîk û ragihand ku ji ber rewşa Guven derbasî qonaxa krîtÎk bûye dê rojên bê hemû saziyên tenduristiyê vexwînin û wiha got: "Em ê bixwazin ku heyetên serbixwe kontrola tenduristiyê ya muwekîla me bikin. Piştî roja dehan a greva birçîbûnê divê mînakên xwînê bên girtin. Kontrolên rûtîn tên kirin, Vîtamîna B didin, lê ya B1 nadin ku ev vîtamîn hestî û masûlkeyan xurt dike."

**'Dermanê wê yê tumorê jî nadin'**

Parêzer Ozen bi bîr xist ku Guven beriya vê carê jî hatibû girtin û hingî tumor li ser mejiyê wê çêbûbû û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Bi rêya derman pêşî li mezinbûn û belavbûna vê tumorê tê girtin. Birêz Guven, ji roja ketiye grevê û vir ve nikare vî dermanî bigire. Lewma nexweşî lê giran bûye. Em bandora vê yekê dibînin. Piştî roja 30'yî muwekîla me gelekî li xwe kêm kir. Wê hîn bêhtir li xwe kêm bike."

Her wiha Ozen destnîşan kir ku daxwaza Guven daxwazeke demokratîk e divê demildest bi cih were. *AMED*



## Çalakiyên li bajarên Ewropayê didomin

Çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan a li bajarên Ewropayê hatine destpêkirin, didomin.

Di çarçoveya van çalakiyan de kurdistaniyên li bajarê Marsîlya yê Fransayê li dijî tecrîdê û piştgirîdayîna Guven ev 8 roj in di greva birçîbûnê de ne. Her roj bi dehan kurdistanî serdana konê çalakiyê dikin. Çalakger jî bang li kurdistaniyên li Ewropayê dikin ku li dijî tecrîdê tev li çalakiyan bibin.

Bi heman armancê çalakiya li paytexta Danîmarka Kopenhagen û bajarê Stûtgart ê Almanyayê jî ket roja 7'emîn.

Her wiha li paytexta Fransayê Parîsê çalakiya kurdistaniyan di roja 7'emîn de didome. Çalakger çûn serdana Parlementoya Fransayê, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî û ajansa nûçeyan AFP'ê û dosyayên der barê tecrîda li ser Ocalan û berxwedana Guven pêşkêşî saziyan kirin. *BRUKSEL*

## Doza Nisêbînê: Em ne poşman in, me axa xwe parast



Danişîna 5'emîn a Doza Nisêbînê ku 53 kes tê de tên darizandin, li 4'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Mêrdînê di roja sêyemîn de berdewam kir. Danişîn li salona Midûriyeta Bajar a Saziya Ewlehiya Civakî (SGK) pêk hat. Ji bo her girtiyekî, 76 sal cezayê muebbeta giran tê xwestin. Di danişînê de parêzer û malbatên hin girtiyan jî amade bûn. Danişîn, piştî danasîna nasnameyan dest pê kir û Dîlber Tanrikkulu parastin kir.

Dîlber Tanrikulu di parastina xwe ya ku ji 5 rûpelan pêk dihat, bi kurdî nivîsandibû û pêşkêşî dadgehê kir. Di parastinê de Tanrikulu bal kişand ser çalakiya greva birçîbûnê ya Guven û diyar kir ku niha ew di pêvajoyeke pir giran de ne û wiha got: "Vê pêvajoyê qewimînên di sala 2012'an de anîn bîra me. Ez îdiayên der barê xwe de red dikim. Ez hemû polîtîkayên di dîrokê de hatine meşandin, di vê dadgehê de dibînim. Ji ber vê yekê jî pir tiştekê ku ez lê zêde bikim, nîn e."

**Azadî bingeha jiyanê ye**

Piştî Tanrikulu, girtiya bi navê Jiyan Ay parastina xwe kir û wiha got: "Ez tecrîda li ser Ocalan şermezar dikim. Hemû mirov bi awayekî azad ji dayik dibin. Azadî bingeha jiyana mirovan e. Ez jî dixwazim li ser xakeke azad jiyana xwe berdewam bikim. Ez azadiya xwe di azadiya gelê kurd û azadiya Kurdistanê de dibînim. Rêveberiya xweser, jiyan û wekhevî ye. Ji bo avakirina dewleteke nû yan jî parçekirin nîn e. Em bi îdiaya parçekirina dewletê tên darizandin. Ez van sûcdariyan qebûl nakim. Ji xwe derdekî me yê ku em dewleteke nû ava bikin jî nîn e. Em jî mîna hemû kesên li Tirkiyeyê, dixwazin azad bijîn û jiyanek wekhev ava bikin."

**'Ez poşman nîn im'**

Di berdewamê de jî Ay got ku pergala rêveberiya xweser li gelek welatan di meriyetê de ye û wiha berdewam dike: "Li Îngilîstan, Îspanya û Fransayê ev modela dewletê tê esas girtin. Tirkiye jî bo bikeve Yekitiya Ewropayê hin peyman îmze kirin. Ji ber vê li Nisêbînê rêveberiya xweser hat îlankirin. Min jî cihê xwe di nava têkoşîna vê rêveberiya xweser de girt. Ez poşman nîn im. Ger dîsan bibe, ez ê dîsan xendekan bikolim. Ez amade me hezar carî ji bo gelê xwe şer bikim."

**Çareserî bi nêrînên Ocalan e**

Ay destnîşan kir ku mifteya çareseriyê serxwebûna Kurdistanê ye û wiha domand: "Ger ku hûn bixwazin pirsgirêkên li Kurdistan û Rojhilata Navîn çareser bikin, divê beriya her tiştî hûn nexşerêya birêz Abdullah Ocalan qebûl bikin. Li ser Ocalan tecrîdeke dijmirovî heye. Ev tecrîd nayê qebûlkirin. Ev tecrîd tenê şer kûrtir dike. Di vê çarçoveyê de ez berdan û beraeta xwe dixwazim. Ger hûn sê hezar sal ceza jî bidin min, di xema min de nîn e. Em van cezayan qet nas nakin. Ji ber ku li wê derê me tu sûc nekiriye."

Her wiha dadgeh piştî parastina parêzeran danîşîn taloqî îro kir. *MÊRDÎN*



## HPG'ê li ser çeteyên ku pereyan kom dikin hişyarî da

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku di demên dawîn li hin herêmên Kurdistanê û metropolan bi navê hin fermandariyên cuda yên HPG'ê name hatine nivîsandin û bi vî awayî pere ji kurdên welatparêz tên komkirin.

Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku ji ber ku ev agahî gihîştine biryargeha wan a navendî, wan pêwîst pê dîtiye ku daxuyaniyekê bidin û wiha hat gotin: "Beriya her tiştî divê bê zanîn, Hêzên Parastina Gel ên Kurdistanê ku bi ked û piştgiriya gelê me karê xwe yê şoreşgerî dikin, tu biryareke xwe nîne ku nameyan ji gelê me re bişîne û alîkariyê bixwaze. Karên bi vî rengî bi rêya mirovên pê bawer, bi hevdîtinên rû bi rû tên kirin. Ji bilî vê rê û rêbazê kî hewl bide pereyan ji gelê me kom bike, ew çete ne ku ji aliyê dijminê mêtinger ve hatine birêxistinkirin. Ji ber vê yekê bila gelê me ji kesên ku bi navê artêşa me nivîsan ji derdorê re dişînin û pereyan kom dikin, bawer neke."

Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku rêya herî baş ew ku ji kesên welatparêz ku bi rêya van notan pere ji wan tê xwestin, van nivîsan bigihînin fermandariyên wan ku lêpirsîna pêwîst di vê derbarê de baş were kirin û hat diyarkirin ku ger rêyeke nameyan bigihînin fermandariyê tune be divê kesek qurişekî jî nede wan kesan. *BEHDÎNAN*

www.arsivakurd.org




## Li navenda Facebookê alarma bombeyê

**WASHÎNGTON -** Ji bo navenda Facebookê ya li eyaleta Californiaya Amerîkayê alarma bombeyê hat dayîn û avahî ji aliyê polîsan ve hat tehliyekirin. Polîsê New Yorkê gilîyê bombeyê gihand Navenda Polîsan a Menlo Parkê û avahiya Menlo Park a Facebookê hat valakirin. Li gor reutersê gelek tîmên polîsan li avahiya facebookê lêgerîn kirine. Her wiha hat zanîn ku ne tenê avahiyeke 3 qatî ya din a şîrketê jî hatiye tehliyekirin. Hêjayî gotinê ye, ev demek e gelek giliyên bombeyan ji navendên şîrketên mezin re tên kirin ku hinek ji wan rast dernakevin.

# Ji Iraqê 550 hezar kesî koç kiriye

Li gorî rapora Federasyona Penaberan a Seranserî Iraqê, di nava 4 salan de 555 hezar û 730 kesên iraqî bi rêyên ne zagonî ji Iraqê koç kirine û ji van 274 kes di rêyên koçberiyê de mirine. Ev rapor weke encama polîtîkayên hikûmeta Iraqê ye ku gel koçî welatên din dike

Federasyona Penaberan a Seranserî Iraqê bîlançoya welatiyên Iraqê yên ku ji hezîrana sala 2014'an û heta hezîrana 2018'an ji Iraqê koçî welatên din ên cîhanê kirine aşkera kir.

Li gorî rapora Federasyona Penarbaran a Seranserî Iraqê di nava 4 salan de 555 hezar û 730 iraqî bi rêyên ne zagonî koçî welatên cîhanê kirine û li 48 welatên cîhanê daxwaza mafên paneberiyê kirine. Li gorî raporê di nava kesên daxwaza mafên penaberiya siyasî kirine, kesên temenê wan di bin 18'yan de nîne.

Mijara ku di raporê de bal dikişîne koçkirina ciwanan e . Gelo ciwan çima ji axa xwe û welatê xwe koç dikin û diçin welatên Avrupayê. Her wiha gelek caran hatiye nîşandan ku hemwelatiyên Iraqê di deryayan de an jî li ser sînorên welatan jiyana xwe ji dest dane. Bi taybetî ciwan jin û zarok ji welatê xwe koc dikin.

Her wiha tê gotin ku di rêyên cuda de û bi awayên cuda 274 kesan jiyana xwe ji dest daye, ji vana aqûbata 144 kesan ne diyar e. Her wiha bi rêya balafirgehên Iraqê ji 11 welatên Ewropayê bi zorê 7 hezar kes vegerandine Iraqê. Li gorî raporê rewşa derûniya bi sedan kesan nebaş e û zêdeyî 10 kesî an hatine kuştin an jî xwe kuştiye. Her wiha ev bandorek mezin li wan dike hem di milê perwerdeya zarokan û nezanîna ziman û xerabiya welat wan ber bi xwekuştinê ve dibin.

Di raporê de tê gotin ku niha nêzî 35 hezar malbat li wargehên li Yewnanistanê û li welatên Balkanê di rewşên xerab de dijîn. Her wiha tê gotin ku gelek koçber li Tirkiye û Yewnanistanê girtî ne . Li gorî raporê li Ewropa zêdetirî 60 hezar koçber gefa vegerandinê li ser wan e. *BEXDA*




## '250 hezar sûriyeyî dikarin vegerin welatê xwe'

Rêvebirê Rojhilata Navîn û Afrîkaya Bakur ê Komîseriya Bilind ya Koçberan a Neteweyên Yekbûyî Amîn Awad li Cenewreyê ji çapemeniyê re ragihand ku ew texmîn dikin di sala bê de, wê 250 hezar koçberên Sûriyeyê vagerin welatê xwe. Awad xwest ji bo piştgiriya welatên ku koçber kirine mêvan jî 5,5 milyar dolar bê bexşandin.

Awad ragihand ku ji bo vagera koçberan û astengiyên li pêşiya vegera koçberan bi lezbûnê ve girê da û got; "Ger ew karibin wan astengiyên pêşiya koçberan rakin, jimara koçberên ku vegerin dikare zêde bibe; wek bidestxistina ewraqên fermî (tapo,nasname), rakirina astengiya leşkerî ya li pêşiya koçberan." Awad anî ziman ew kesên ku neçûne leşkeriyê an di di leşkeriyê de sefên xwe guhertine, ji bo wan efû derketiye. Awad wiha berdewam kir: "Li Sûriyeyê bi giştî şer xelas bûye. Idlib jî di nav de çend der mane. Ew der jî di nava sînorên muzakereyan de ye ku şer lê çênebe. Halê Sûriyeyê çendîn xweş bibe, wê ewqas koçber vegerin welatê xwe. Niha li Tirkiye, Urdunê, Lubnan, Iraq û Misrê 5,6 milyon sûriyeyî hene." *ŞAM*



## Êrîşkarê Strasboûrgê 27 caran ketiye girtîgehê



Li Fransayê, di dema çalakiyên Êlek Zeran ên li hemberî polîtlkayên hikûmetê de, li Strasbourgê li dijî bazara Noelê êrîşek pêk hat. Derkete holê êrîşkarê ku ev êrîş pêk aniye beriya niha 27 caran ketiye girtîgehê û ceza xwariye.

Tetikkêşê di nav kategoriya "S" a lêgerînê de, êvara sêşemê li bazara Noel a li navenda Strasboûrgê êrîşeke çekdarî pêk anî. Li gorî bîlançoya dawî 3 kes hatin kuştin û 13 kes jî birîndar bûbûn. Dozgeriya Antîteror a Parîsê der barê êrîşê de lêpirsîn dabû destpêkirin.

Piştî bûyerê leşkeran gule berî êrîşkar dan û ew birîndar kiribû. Lê belê bi birîndarî ji cihê bûyerê reviyabû. Çavkaniyên nêzî Dozgeriya Parîsê ragihand ku êrîşkar hatiye destgîrkirin.

Li gorî çapemeniya Fransayê êrîşkarê bi navê Şerîf C. yê di sala 1989'an li Strasboûrgê ji dayik bûyî, bi taybetî ji ber sûcên dizî û tundiyê sicîla wî ya edlî gelek tije ye. Tê ragihandin êrîşkarê ku li Fransa, Almanya û Swîsreyê ji ber sûcên edlî 27 caran hikum xwariye, gelek caran ketiye girtîgehê. Her wisa êrîşkar di lîsteya kesên lêgerîna wan heyî û di kategoriya "S" de ye û ji hêla îstîxbarata hundir ve lê tê gerîn. *STRASBOÛRG*

## Partiya wê pê nebawer e çareser bike

Li Îngilistanê ji ber pirsgirêkên pêvajoya veqetîna ji Yekitiya Ewropayê (Brexit) di nav partiya desthilatdar Partiya Muhafazakar a ku serokwezîra Îngilistanê Theresa May serokatiya wê dike krîza siyasî derket. Gelek parlamenterên partiyê ji bo serokwezîra xwe May pêvajoya dengdayîna pêbaweriyê dan destpêkirin.

Serokê Komîteya 1992'yan ê partiyê Graham Brady têkildarî mijarê daxuyaniyek da. Serok Brady diyar kir ku ji bo destpêkirina pêvajoya dengndayînê pêwîst e 48 parlamenter 'Nameya Pênebaweriyê' bidin û wan ev hejmar temam kiriye. Brady anî ziman ku dengdayîna pêbaweriyê ji bo partî, hikûmet û welatê wan başî ye.



**Divê bê paşxistin**

Her wiha serokwezîr May jî têkildarî dengdayîna pêbaweriyê ya li hemberî xwe axivî û diyar kir ku dê heta dawiyê li dijî vê biryarê têbikoşe û wiha got: "Guhertina serokatiya Partiya Muhafazakar dê pêşeroja welat bike xetereyê. Divê dengê referandûmê bikeve meriyetê. Em amade ne ku vî karî bi dawî bikin."

Wezîrê Dadê yê Îngilistanê jî têkildarî dengdayîna pêbaweriyê ya ji bo May axivî û ev tişt anî ziman: "Heke May dengdayînê winda bike divê di reweşeke wiha de Îngilistan veqetîna xwe ya ji Yekitiya Ewropayê (YE) rawestîne ango bi paş de bixîne. Ez bawer nakim ku Îngilistan di 29'ê adarê de ji YE'yê veqete."

**Piştgirî da May**

Li aliyê din Wezîrê Bazirganiyê yê Îngilistanê Liam Fox li ser hesabê xwe yê medyaya civakî daxuyaniyek da û piştgiriya xwe ya ji bo May anî ziman. Fox angaşt kir ku welatê wan li şûna parçebûnê ji partiya wan aramiyê dixwaze.


May dengdayîna ji bo veqetîna ji YE'yê ya ku diviya di 11'ê mehê de pêk bihata, bi hinceta rewşa Îrlandaya Bakur paşde xistibû û bi serokên YE'yê re careke din dest bi hevdîtinan kiribû. Li ser vê yekê Îrlanda û YE'yê bertek nîşanî Mayê dabûn û gotibûn ku dê êdî veqetîna bi Îngilistanê re guftûgo nekin. *LONDON*

## Trump: Di nav 30 rojan de dê dawiya wan bê

Serokê Amerîkayê Donald Trump li Koşka Spî ya Amerîkayê derheqê rewşa dawî ya têkoşîna li dijî DAIŞ'ê li Sûriyeyê û Iraqê destnîşan kir ku wan li dijî têkoşînek mezin daye û dê di nav 30 rojan dawiya wê bê.

Nûnerê taybet ê serokê Amerîkayê yê Hevpeymaniya Navdewletî ya li Dijî DAIŞê Brett McGurk jî di civîna wezareta derve de da xuyakirin ku ji hêla leşkerî ve dawiya têkoşîna dijî DAIŞ'ê hatiye û got, "Pêwîst e em ji bo berdewamiya serkeftinan û avakirina hêzên ewlekariyê ji bo wan deveran piştrast bin."

Trump jî di merasîma îmzekirina zagona parastina kêmahiyên li Iraq û Sûriyeyê de, der barê têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de diyar kir ku Amerîkayê ji roja pêşî ve têkoşîneke bi biryar li hemberî wê daye û wiha axivî: "Me li dijî DAIŞ'ê karekî mezin kiriye. Li wê herêmê hejmara wan pir kêm maye û di nav 30 rojan de yek ji wan namîne." *WASHÎNGTON*





## Ji bo Demîrtaş bertek nîşanî Tirkiyeyê dan


Li bajarê Fransa Strazbourgê rûniştina giştî ya Parlamentoya Ewropayê pêk hat. Nûnera Têkiliyên Derve ya Yekitiya Ewropayê Federîca Mogherinî jî beşdarî vê civînê bû û beşeke axaftina xwe ji doza hevserokê berê yê HDP'ê Selahattîn Demîraş re veqetand. Mogherînî bal kişand ser doza Demîrtaş û diyar kir ku ew li şûna qedera mirovekî rewşa demokrasiya welatekî nîqaş dikin û wiha got: "Em mafên civakî û takekesî û azadiyên welatekî nîqaş dikin. Di du salên dawîn de em şahidiyê ji girtina siyasetmedar, rojnameger û akademîsyenan re dikin."

Mogherînî di berdewamê de jî got ku ji ber polîtîkayên hikûmetê daraza serbixwe ya Tirkiyeyê xesarê dibîne û mafên bingehîn ên mirovan tên binpêkirin. Raportora Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê Katî Pîrî jî têkildarî doza Demîrtaş axivî û diyar kir ku divê Tirkiye biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ya der barê Demîrtaş de pêk bîne û wiha got: "Em li pişta Demîrtaş in. Demîrtaş hikumxwarekî siyasî ye û ji ber vê yekê niyeteke Erdogan tuneye ku wî berde. *STRAZBURG*

www.arsivakurd.org

Kirmanckî

13 Kanûne 2018 Panşeme



## Bi hawayo birîndar hucreyo yew kesî de tepişîyeno

**ŞIRNEX –** Koyê Gabarî yê Şirnexî de 31ê teşrîna verêne de operasyonê leşkerî pê ame. Operasyon de endamê HPGyî Emrah Naycîyî birîndar ame tepiştiş. Naycîyî 7 rojan binê çiman de mend û ame tewqîfkerdiş. Naycîyî aye roje ra nata bi hawayo birîndar Zindanê Tîpa Tyî yê Şirnexî de hucreyo yew kesî de yeno tepiştiş. Ame dîyarkerdiş ke bedenê Naycîyî de parçeyê şarapnelî estî û hucre de yeno tepiştiş. Ame musayene ke Naycî seba tedawî muracat kerdo, la heta nika ti cewabêk nêgirewto.



# Ma do cewabê faşîzmî bidî

Amadekarîya weçînayîşê herêmî bêmabên dewam kena. Parlamentera HDPyî ya Îzmîrî Serpîl Kemalbaye dîyar kerde ke îqtîdar do 31ê adare de bêro cezakerdiş û va: "Îqtîdar wazeno cinîyan mîyanê sîstemê kapîtalîst de vindî bikero. Ma do 31ê adare de cewabê faşîzmî bidî."

31ê adare de do Tirkîye de weçînayîşê herêmî pê bêro û pêroyê partîyê sîyasî seba weçînayîşê herêmî xebatanê xo yê weçînayîşî dayî destpêkerdene û xebat dewam kenî. Parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Îzmîrî



Serpîl Kemalbaye derheqê tîfaqê cinîyan kerde û dîyar kerde ke bi taybet hetê cinîyan de weçînayîşê 31ê adare zaf muhîm o.

Kemalbaye destpêkê qiseykerdişê xo de va 'prosesêko faşîzm tede bîyo komel cuwîyeno' û wina dewam kerde: "24ê Hezîrane de seba ke faşîzm bibo komel xeylê aver şî. Ganî heme cinîyî seba rijnayîşê rejîmê yew kesî têkoşîn bikerî. Weçînayîşê 24ê hezîrane ra nata waştişê aştî, azadî û demokrasî dewam keno. Her çiqas ke hemverê şarî de hêriş bêro kerdiş zî, şar weçînayîşê prosesê kehenan de zî demokrasî de israr kerd. Şar do weçînayîşê 31ê adare de hêzê xo nîşan bido."

**Keda cinîyan nîna dîyayîş**

Kemalbaye qiseykerdişê xo de daye zanayene ke piştî û yewîya cinîyan do proseso zehmetin ke yeno cuyayîş derbaz bikerî û domnaye: "Beno ke rojeva ma ya cîya biba. Labelê rejîmê yew kesî yê camêrd heme cinîyan tehdit keno. No proses de qezencê cinîyan ameyî xespkerdiş. Cinîyan ser de sîstemêko binpaykerdişê kede esto. Hewl danî cinîyan ser de sîstemê yew kesî yê camêrdan daîmî bikerî. Îqtîdar wazeno cinîyan mîyanê sîstemê kapîtalîst de vindî bikero. Keda cinîyan nîna dîyayîş. Îqtîdar wazeno 'profîê cinîya makul' awan bikero."


**Ganî ma bixebetî**

Kemalbaye arde ziwan ke îqtîdar tewr zêde cinîyan mîyanê keye de heps keno û va: "Cinî cîya yenî vînayîş. Ganî cinîyî weçînayîşê 31ê adare de têkoşînê xo gird bikerî. Ganî ma vindetişo ke cinîyan heme cayan de wayîrê vatişî bikerî bidî nîşandayîş. Seba ke ma weçînayîş de îqtîdarî ceza bikerî û birijnî, ganî ma bixebetî. Qayûmî derbê giran dayî cografyaya kurd û cinîyan ro. Tayînkerdişê qayûman de îradeya şar ame xespkerdiş."

**Cinî ameyî tecawizkerdiş**

Kemalbaye tewr peynî wina va: "Ma namzedanê xo esasê seyyewbînanî û sîstemê hemserekî de weçînenî. Ma Dayîka Taybet ke bi rojan cenazeya aye raşteyan de mend vîrî nêkenî. Ma bi desan cinêyê ke Efrînî de ameyî tecawizkerdiş vîrî nêkenî. Ma no fehmî şonê weçînayîş. Ma do 31ê adare de cewab bidî faşîzmî." ***STENBOL***

## Problemê cinîyan nê yê camêrdan esto



***STENBOL* -** Nuştox û rojnameger Seda Guler Kaya dîyar kerde ke sîstemê serdest yê camêrdan tena cinîyan nê camêrdan zî binpay keno û seba ke nêseyyewbînanî raşte ra wedarîyo ganî camêrdî bibî wayîrê fehmî. Kayaye derheqê keye û rolê dayikbîyayîşî de qisey kerde û va: "Şîdet û kiştiş tena problemê cinîyan nîyî. No problemê camêrdan o. Problemê ke camêrd awan kenî û camêrdan ra virazîyenî estî. Problemê ke estî pîya yenî çareserkerdiş."

## Nasname vera nîna amelîyatkerdene



***DÎLOK* –** Taxa Mevlana ya qezaya Şehîtkamîlî ya Dîlokî de dayîka 4 domanan Cemîle Demîrhana 68 serrî seba ke qeyda aye ya nufusî nêameya viraştiş nasnameyê aye çin a û nêeşkena şêra nêweşxane. Seba ke kerra Demîrhane de esta, ganî bi hawayo lez bêra amelîyatkerdiş. Torinê aye Huseyîn Akayî dîyar kerd ke ê muracatê Mudirîya Nufusî kerdî û Mehkemaya Dîlokî de doza înan dewam kena. Akayî ard ziwan ke rewşa dapîra ci xidar a û nêweşxane nêewnenî.



## Zîlana ke gule gina bedenê aye

Serê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan yê Cîzîrî ke 14ê Kanûna 2015î de amebî îlankerdiş ra 3 serrî derbaz bî û qedexe 79 rojan dewam kerdbî. Qedexe de bi seyan kesî cuya xo vindî kerdî û xeylê kesî zî birîndar bîyî. Qedexe de domanî bîyî hedefê guleyan, cuya xo vindî kerdî û birîndar bîyî. Nînan ra yew zî Zîlana 7 serrî ya. Zîlane wextoke tewrê dayîka xo şîyêne dikan bîye hedefê guleyan û nika seba amelîyato diyîn xo amade kena. Zîlane rayîrşîyayîşî de zehmetîyan ancena. Babete ser o dayîka Zîlane Hamdîye Yîgîte qisey kerde.

Hamdîye Yîgîte derheqê hedîseyo ke 15ê çeleyê 2016î de taxa Yasef de ame cuyayîş de qisey kerde û va: "Polîsî ameyî taxe û vatî 'Ma keye de cigêrayîş kenê' û kewtî keyeyan. Ma zî teber de vindertî. Kêna mi zî waşte ke şêro market. Mi zî polîs ra pers kerd. Ey zî va 'beyraqa sipî bigî û şo'. Ma şî dikan pey ma ra vengê guleyan ame. Wayîrê dikanî rema. Ez, kênaya xo û çend keyeyê bînî dikan de mendî. Guleyêke gina dêsî û dima ra gina kêna min ro. Badê hedîse ma şîyê nêweşxane û uca de çîyêk nêkerdê. Ma eşrawitî Amed. O wext amelîyat bî. Kênaya mi hema zî dermankerdişê fîzîkî vînena. Doktoran va 'seba birînan esteyî helîyenê'. Hema pîze û pişîya kêna min de birîn estê." ***ŞIRNEX***

## Qayûm awa Hezexî birna

Roja ke qayûm tayînê şaredarîya Hezexî bîyo ra nata şarî rê tu xizmet nêameyokerdiş û problem dewam kenê.

Hamnanî bi aşman awe û cereyan qeza de ameyî birnayîş û bi rojan hemwelatîyan tankere ra awe antî. Bî hewteyêk reyna awe ameya birnayîş û ame zanayîş ke seba awa şilîye kewta mîyanê awe, ameya birnayîş. Hemwelatîya taxe Yildiz Elçîogluye reaksîyon nîşanê qayûmî daye.

Elçîogluye daye zanayene ke hamnanî de di aşman awa înan ameya birnayîş û aşma Remezanî de bêawe derbaz kerdê û wina va: "Xora şaredarî bêkes a. Tena derdê meaşanê xo de yê. Şar xema înan de nîyo. Aşma Remezanî û



roşan de awa ma çin bî. Tewr peynî mi bîdon girewt û ez şîya qeymeqamtî. Avûkatê qeymeqamî heqaret ro mi kerdî û mi eştî teber. Ma pereyê xo danê. Ma hamnanî bi tankêran awe ante. Pereyê awa tankêre zî ma ra girewtî. Wexto ke awa ma birnayene bî zî fatura ameyêne. Pere girewtêne û awe nêdayne. Badê ke qayûm ame, şaredarî şarî rê amî padayîş. Ma 15 cinî û di camêrd pîya şî verê qayûm. Ma berdî verê mudirê ozel kalemî. Ma uca de rastê heqeretan ameyî û ma vetî." ***ŞIRNEX***

## Tena yew mamosta estbî



***DÊRSIM* –** Dêrsim de mamostaya matematîkî Tîjda Kiliçe seba ke mamostayîya bi heq bikera 3 aşmî verê cû muracatê Mudirîyeta Perwerdeyî ya Qeza kerde. Badê demêk muracatê Kiliçe ameye qebulkerdene û Mektebê Mîyanên yê Pulumurî de dest bi mamostayî kerde. Kiliçe 3 aşman ra dima bin nameyê 'cigêrayîşê ewleyî' kar ra ameye eştene û 10ê kanûne de nuşteyo ke aye rê ameye erşawitene de ame vatiş ke 'wezîfeyê mamosta Kiliçe ameyo betalkerdiş.'



## Herinda çayî de şekiro girnaye nêbo nêbeno

Herêma Serhedî de şekiro girnaye taybetmendîya herêma Serhedî yo û bi destê cinîyan yeno amadekerdiş. Şekiro girnaye herinda çayî de yeno werdiş û sey kulturêk o. Mîyanê şekiro girnayene de goz, kizwan, findiq û fistiqî estî. viraştiş goreyê tercihî bedilîyeno. Derheqê girnayîşê şekirî ke bîyo sey kulturê herêma Serhedî de cinîya bi nameyê Ciweyra Încîye qisey kerde.

Încîye qiseykerdişê xo de wina va: "Bi serran o no kultur dewam keno. Serhed de çaya bê şekiro girnaye bê tehm o. Herinda çayî de şekiro girnaye nêbo nêbeno. Mah eme demserran de no şekirî xebetnenî. La tewr zêde zimistanî de yeno xebetnayîş. Tîya de heme kes çay wina şimneno. Na girnayîş û viraştişê şekiro girnaye dayîkanê xo ra musayî. Ganî no kultur dewam bikero." ***COLEMÊRG***

## 3 mîlyon lîre ame xerckerdiş



***RIHA* –** Mudirîya Herême ya Weqfan 2015î de seba ke awe kewtêne camîyê tarîxî yê Doşemeyî yê Riha û zemînê camî ver bi Gola Maseyan de şîyêne dest bi restorekerdişê camî kerde. Her çiqas ke 3 serrî derbaz bibo zî restorasyon hema nêqedîyayo. Îhaleyo ke ame kerdiş de vajî ya ke ganî 2017î de restorasyon biqedîyo. Adara 2016î de xebat ameyî vindetiş. Goreyê îhaleyo newe zî ganî 2019î biqedîyo. Ame zanayene ke heta nika 3 mîlyon lîre xerc bîyo.



## Meraqîya domanî açarna mesleke

Cinîya bi nameyê Azîze Batmaze bi keda adestê xo ekonomîya xo qezenc kena. Batmaze emrê qijekî de bi makînaya deştişî ya dayîka xo dest bi deştiş kena û nika wayîrê dikanê deştişî ya.

Batmaze dîyar kena ke her ke pîl bîya deştiş ra tewr hes kerda û wina va: "Ez hêdî hêdî musaya. Badê ke ez karê xo de aver şîya, mi xo rê makîneyêke girewt. Mi rîyê lihîf û balişna deşt. Dima ra mi fistanî deştî. Ez seba ke debara xo xebetîyena. Ez şîyayeyê domananê xo vejena. Makîneyê mi keye de bî. Mi kar keye de kerdêne. La her wext muşterî ameyêne keye. Mêrdeyê mi reaksîyon ramojna. Mi zî va qetî ez fek karê xo ra vera nêdana. Dima ra ez kewta dikanêke qij. Mi dikan sererast kerd û soba da ro. Dikan de hem ez rehet xebetîyena û hem zî muşterî rehet ê." ***WAN***

www.arsivakurdi.org

# 'Dewletê goştê me xwar, em hestiyan dixwazin'

***Dema mirov dibêje bîr, du tişt tên bîra mirovan; yek bîra avê û yek jî bîr ango hiş. Belgefilma "Bîr" cara ewil hat pêşandan. Malbatên ji bo dîtina cenazeyên xwe têdikoşin wiha dibêjin: "Dewletê goştê me xwar, em hestiyan dixwazin."***



**Bîlal GULDEM / AMED – MA**

Di çarçoveya çalakiyên Hefteya Mafên Mirovan de Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Amedê, Weqfa Mafên Mirova ya Tirkiyeyê (TÎHV), Odeya Bijîşkan a Amedê, Baroya Amedê û Înîsiyatîfa Mafan, Belgefîlma "Bîr" a ku behsa windahiyan dike dan pêşandan. Pêşandana belgefîlmê li Şanoya Bajêr a Amedê pêk hat. Di pêşandana belgefîlma "Bîr" a ku cara ewil e li Tirkiyeyê û bajarên Kurdistanê tê pêşandan de nûnerên rêxistinên mafên mirovan û gelek welatî beşdar bûn.

Derhênerê belgefîlmê Veysî Altay jî di pêşandanê de amade bû. Belgefîlma "Bîr" behsa çîroka 7 welatiyên ji gundên navçeya Kerborana Mêrdînê yên ji aliyê JÎTEM'ê ve hatin windakirin dike. Belgefîlma di şexsê têkoşîna malbatên her 7 windayan de behsa têkoşîna hemû malbatên windayan ên ku li Qada Galatasarayê li aqûbeta xizmên xwe dipirsin dike. Her wiha di belgefîlmê de behsa lêgerîna malbatan a ku xizmên wan di bîran de ne dike. Têkoşîn û lêgerîna malbatan a ji bo dîtina hestiyên zarokên xwe kêlî bi kêlî di belgefîlmê de tê vegotin û nîşandan; heta ku malbat hestiyên xwe dibînin û hestiyên xwe binax dikin.

**Hestî riziyan**

Dema mirov li belgefîlmê temaşe dike ji bilî xemgînî û zilmê tiştek nayê bîra mirovan. Belgefîlm ji serî heta dawiyê tije êş û xem e. Mirov di belgefîlmê de dibîne ku mirov çawa bi hovane hatine kuştin û windakirin. Gotin di cih de be her kêliyeke dokumanterê mûyê canê mirov dike şûjin. Mirov bi kelecan dibe.

Di kêliyek belgefîlmê de di şikeftekê de cilên windayan tên dîtin. Di cilan de hêj şopa gulan heye û tê xuyakirin ku çend gule li bedena mirovan dane û wan avêtine bîrên bê binî. Hestiyên mirovan di bîrên bêdengiyê de, di binê ax û şikeftan de riziyane. Dema hestî tên dîtin êdî cihê gotinê namîne, tenê çavek zîqmayî û xemgîniyek li ser rû xwe berê hemû deştên dilê mirovahiyê dide û dar, sewal, xweza, av û çiyayan jî bi xwe re xemgîn dike.

Hin kêliyên belgefîlmê jî xweşikiya li ser rûyê vê erdnîgariyê vedibêje; ji xweşikiya çiyayên bi heybet bigire heta xwezayê... Belgefîlm dibêje li ser erdnîgariyek ewqas xweşik û têr û tije çawa qetilkirin, windakirin, îşkence û bîrên sar bûne para mirovan û her bihostek vê axê veguheriye "gorên komî"!...



**Rastiya gorên komî**

Di şikeft û bîran de hestiyên mirovan tên dîtin. Bedenên mirovan li ser hev kom kirine û binax kirine. Ji ber vê yekê ye jê re dibêjin "gorên komî." Rastiya gorên komî di belgefîlma "Bîr" de her tiştî bi zelalî vedibêje. Ew dayik her hefte li Qada Galatasarayê behsa vê hovîtî, rastiya gorên komî, rizandina hestiyên zarokên xwe dikin. Tenê çend gotinên wan hene û wiha hestên xwe tînin ziman: "Ew birin û êdî min ew nedît. Bi salan e çavên min li rê ne. Ez hêj dibêjim belkî saxbin werin jî. Cenazeyê zarokên me hestî bin jî, em wan hestiyan dixwazin. Bila tenê gorek zarokên me, hevjînên me û xwişkên me hebe, da ku em carna dikaribin biçin ser gorên wan. Bila em dizanibin ku hestiyên me li ku ne. Heta em saxbin em ê doza hestiyên xwe bikin. Heta em saxbin wê ev têkoşîn li vê qadê dewam bike."

Yek ji tişta herî balkêş a ji axaftinên xizmên windayan ku di dokumanterê de diaxivin jî ew e, "Dewletê goştê zarokên me xwar, em hestiyan dixwazin." Ev hevok dilê mirovahiyê disojîne. Mirovan matmayî dihêle û diponijîne.

Yek ji wan mijarên belgefîlmê jî ew e ku berxwedana malbatan a bi dehan salan tê pêşandan. Malbat bêyî ku li şilî, berf, sir û seqem, baran, qêleqija havînê, mertal, polîs, bariyer û astengiyan guhdar bikin berê xwe didin Qada Galatasarayê û li vir her hefte behsa serpêhatiyek windayek dikin. Her wiha têkoşîna malbatan a ji bo dîtina cenazeyan hêjayî dîtinê ye. Li ser her bîrê behsa bûyer tê kirin.

Malbat bi şev û roj, bi meh û salan têkoşîna dîtinê ya hestiyên xizmên xwe didin. Di vê dema dûr û dirêj a lêgerînê de derûniya malbatan a ku şûna xwe ji trajediyê re berdide mirovan ber bi cîhanek din ve dibe.

**Êş dibe mizgînî**

Herî dawî jî di belgefîlmê de derhêner diçe cem malbata yek ji windayan a Abdurrahman Coşkun û agahiya ku hestiyên zarokê wan hatine dîtin û dê bên veşartin dide dayik Hediye Coşkun. Dayik vê agahiyê wek "mizgînî" bi nav dike û ji derhêner re dibêje "te mizgînî ji me re aniye." Êşa bi salan a malbatan ji bo dîtina hestiyan vediguhere "mizgîniyê" lê ev yek vê tîne bîra mirovan û mirov dibêje "kişandin û nekişandina êşê dibe yek gelo? Ka gelo êşek wiha di 30-40 salên dawî de li tu devera cîhanê hatiye kişandin?"

Piştî ku malbat hestiyên xizmên xwe dibînin ji bo testa DNA'yê hestiyan radestî Saziya Tiba Edlî dikin. Piştî testa DNA'yê malbat hestiyên xwe ji ber ku tenê hestî mane di kîsikek biçûk de di hundirê darbestên xemilandî de oxir dikin.

Piştî pêşandana belgefîlmê hin kes ji ber ku xemgîn bûn yanî rondik ji çavên wan dibariyan li benda gotûbêja derhêner jî neman. Wexta ku pêşandan qediya derhêner Weysî Altay xwest li ser belgefîlmê gotûbêj bike. Lê ji ber ku çîrok, têkoşîn û berxwedana malbatan bi zelalî tê vegotin, gotina pirsê û nirxandina belgefîlmê ji qirika mirovan dernakeve.



## Muzîkjen Demîrhan hat oxirkirin


**Muzîkjen Îsmet Demîrhan li paytexta Swêdê Stockholmê bi merasîmekê hat oxirkirin.**

**Demîrhan sala 1991'ê koçî Swêdê kiribû û ji ber nexweşiya pençeşêrê çû ser dilovaniya xwe. Demîrhan ku şagirtê hunermendê navdar ê neyê Bînalî Selman bû, piştî ku hat Swêdê di çalakiyên şoreşgeran, mirovên pêşverû, kurdistanî û elewiyan de hunera xwe pêşkêş kir.**

**Hunermend Demîrhan bi qedir û qîmet bû. Gelek mirovên ji netewe û baweriyên cuda yên li Swêdê; kurd, tirk, asûrî-suryan, ermen, êzidî, elewî û sinî di merasîma cenazeyê Demîrhan de li hev civiyan. Li gorî wesiyeta wî, li ber stranan cenazeyê wî hate veşartin.**

**Yek ji hevalên Demîrhan hunermend Armanc qala Demîrhan kir û bi bîr xist ku 2 caran saetekê û saetek û 3 deqeyan bênavber li neyê xist û bi vî rengî cihê xwe di pirtûka Rekoran a Gûînnessê de girt.**

**Armanc wiha got: "Hunermendekî welê bû ku gelekî hez ji karê xwe dikir û bi micidî dikir. Hema bêje di hemû CD'ên hevalên me de cih girt. Yekî dilnizm û piştevan bû. Bi muzîka hemû gelên bindest re eleqedar bû. Bi taybetî muzîka ermenan gelekî girîng didît. Bi komên ermen, suryan û kurdî re demeke dirêj xebitî. Mixabin di 54 saliya xwe de ji ber kanserê çû ser dilovaniya xwe." *STOCKHOLM***



## *Bi tabloyên xwe 230 peyamên cuda dan*

Li Hola Yulyem Yuhena ya Navenda Çalakiyên Hunerî ya Perwerdeya Rojava ya Silêmaniyê, pêşangehek hat vekirin.

Di pêşangehê de 230 tabloyên mamostayan hatin nîşandan. Her mamosteyek bi tabloyekê beşdar bûn. Her wiha her yekê peyamek cuda dida. Armanca pêşangehê nîşandana hêz û gihandina peyama mamosteyan a ji bo civak û hikûmetê bû. Bi tablo û posterên xwe, hikûmetê rexne dikin, qala rewşa jin, zarok, jîngeh, perwerde, torên civakî, ruhê hevkariyê, parastina avê û gelek mijarên din dikin. ***SILÊMANÎ***

# Ji bo Efrînê wêneyan xêz dike

**Elî KEDRO – Xandî ELO / ŞEHBA - MA**

Welatiyê bi navê Behcet Ehmed (56) ji gundê Termîşo yê girêdayî navçeya Şiyê ya Efrînê wêneyan der barê 58 rojên berxwedaniyê ku di mejiyê wî de mane, xêz dike.

Dema ku Behcet Ehmed 10 salî ye dest bi xêzkirina wêneyan dike û niha jî bûye şêwekar. Wêne yek ji xeyalên Ehmed e, dema ku xwendina xwe di peymangeha Ehmed Ismayîl a hunerên şêwekariyê li paytexta Sûriyeyê Şamê xelas dike, xeyalên xwe dike rastî.

Behcet Ehmed dema ku xwe fêrî xêzkirina wêneyan dike rastî gelek zehmetiyan tê, di nav de dema ku refa 3 ya amadekariyê de xwendin terk dike, her wiha malbata wî nahêle di peymangeha hunera şêwekariyê de bixwîne, lê Ehmed bi israra xwe zehmetî derbas kirin.

Piştî ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî kantona Efrînê kir û komkujî pêk anîn, şêniyên wê neçar man jê derkevin û berê xwe bidin kantona Şehbayê. Ji bo ku Efrînê hertim di hişê Ehmed de be, dest bi xêzkirina hin gund û navçeyên Efrînê her wiha navenda bajêr kir. Di wêneyên wî de çiyayên bilind hemû bi rengê kesek û darên zeytûnê her wiha xweşikiya Efrînê û xwezaya wê tê dîtin.

Her wiha Ehmed wêneyekî bajarê Efrînê bi rengê reş xêz kiriye. Ehmed destnîşan dike ku ew wêne êrîşên dagirker û komkujiyên derheqê welatiyên wê pêk hatin, nîşan dide. Tevî ku alav û pêdiviyên xêzkirina wêneyan tine ne jî, hemû wêneyên xwe bi pênûsa hibrê xêz dike.

Behcet Ehmed da zanîn dema ku wêneyekî xêz dike rastî gelek zehmetiyan tê lê mayîna Efrînê di bala wî de û nîşandana berxwedana wê û derxistina xwezaya wê, kir ku di xêzkirina wêneyan bi israr be.



www.arsivakurdi.org